

Kurmanciya Kurdistanana Sor

Kamîz Şeddadî

NASANDINA DEVOKÊ Û DEVERÊ BI KURTÎ

Kurdistanana Sor li rojavayê Azerbaycanê ye, dikeve navbeyna Ermenistan û Qerebaxa Çiya. Ji bajarên: **Kelbecer (Kavilbajar)**, **Laçîn**, **Qubadlî**, **Zengilan û Cebraîl** û gundewarên wan pêk dihat. Gundên azeriyên tirkîaxêv û kurdên kurmancîaxêv di nav hev de bûn. Salên 1923-29 bi fermana hikumeta Sovyetê weke **deverekî taybet (Kurdistanskiy Uyezd)** hatibû veqetandin û bi awayekî ne fermî wekî Kurdistanana Sor dihat binavkirin. Li gorî statîstîka fermî sala 1929 hejmara kurdan li deverê 79 000 kes bûye (yên kurdî zanibûn).

Di warê ziman de hin xebat hatibû kirin. Lê paşê dever hat lexvkirin û xebatên li ser ziman jî hat rawestandî.

Şêniyên deverê mislimanin, **şîemezheb in**. Xwe weke **kurmanc**, zimanê xwe jî **kurmancî** binav dikin.

Dîroka peydabûna kurdan li Qafkasya û Azerbaycanê digihêje beriya îslamiyetê. Sedsalên 10-12 dewleta Şeddadiyan bi serbajarê Gence beşekî mezin ê başûrê Qafqasyayê bi xwe ve digirt. Bi hatina Selcuqîyan hukmê wan ne ma.

Assîmîlasyona ziman li wê herêmê hêj ji sedsala 19-an destpê kiriye.

Ta salên 1990-ê 11gund li Laçîn, 6 gund li Kelbecer, 9 gund li Qubadli, 6 gund li Zengîlanê zimanê xwe (duzimanî) parastibûn. Lê dîsa jî zimanê esasî azerî bû. Lewma jî tesîrê azerî gelek li ser devokê heye, bi taybetî di **fonetîk** û **sîntaksîsê** de.

Salên 1992-93 ew devera bi navê Kurdistanana Sor ji aliya Ermenistanê ve hat dagirkirin û şêniyên wê bi tevayî jê derketin û belavî tevaya Azerbaycanê bûn.

Di encamê de dever ji kurdan hat paqijkirin û zimanê kurdên wê deverê jî heta hetayê winda bû!

Azarbaycanê sala 2020-ê qismen û sala 2023-ê jî tevaya erdên xwe yên dagirkirî (Kurdistanana Sor û Qerebaxa Çiya jî tê de) ji destê Eremenîyan rizgar kir.

Vê gavê li wê deverê ne kurd, ne azerî ne jî ermenî tunene. Dibe ku pêştî çend salan şêniyên berê dê vegerin warên xwe, lê êdî kurdîaxêv di nava wan de tune bin.

Roja îro ji şêniyên Kurdistanana Sor kesên ji 60 salî jêrtir bi kurdî nizanin.

Taybetmendiyên devokê Kurdistanana Sor

Devokê Kurdistanana Sor nêzî devokên **Xorasan**, **Meraş**, **Meletî**, **Dîlok**, **Sîvas** (qismen Rûha, û Efrîn) ê ye.

Taybetmendiyên devokê:

Gelek caran dengê *ê* di dawîya peyvê de dibe *e*:

- **bave min; biraye min;**
 - **Emî je Laçîne (Lêçîn) ten** (Em ji Laçînê tên)
- Carna **b** dibe **p**.

mînak: **pin** – *bin*.

- **Le pin siye dareke** – Li bin siyê darekê;
- **pîn** – bîn (bîhn);
- **pîstin** – bihîstin: **ezî depîzim** – ez dibihîzim;
- **parîn**- barîn; **şilli depari** – baran dibare.
- **perefkirin** – berhev kirin;
- **p`ar** – bahar...

Carna **d** dibe **t**:

- **tîyan** – diran, didan; **tî** – dîh, dêh, gund. (Dema Sovyetê de li Laçînê navê gundekî kurdan **Zêr-tî** bû; bi wateya *Gundê zêrîn – ji ber rengê komunîstan);
- Dengê **h**-ya wek li deverên din di peyva “heft” (ح) di vê devokê tune/nîne.
- Komdengê “**xw-**”:
- **xwe (xue, xwe)**
- **xuşk**
- **xorun** (xwarin), **xostin** (xwastin) :**ezî dexozum**
- **xandin**, lê **dexunum**;

Gelek caran di peyvên pirkite de dengdêrê navîn tê şidandin:

- **avva sar** – ava sar
- **bavve min** (bavê min);
- **dakka wî** (diya min, dayka min);
- **lakka birê min** (lawikê birayê min)
- **ezî dellîzim** (ez dilîzim);
- **ezî deppîzim** (ez dibihîzim)
- **dellegur** (dêlegur, gurga mê)

CÎNAV

Cînavên kesî yên xwerû:

- **ez, tû, ew, em hûn, ew (îde, îne)**

Cînavên kesî yên çemandî/tewandî:

- **min, te, we//wê, (e)wî, me, we, wan (ew(a)na)**

Cînavê veger:

- **xwe (xue, xe).**

Cînavên nîşandêr:

- **va, vî, ve, van;**
- **ew – van, ewan;**

yên nêzîk:

îva (nêr) – **eva** (mê), **ew**;

yên dûr:

- **îha** (nêr) – **êha** (mê);

Cînavên nisbî (di devokê de li gorî cinsan nagorin):

Yên yehejmar:

- **yê (ê); î, eha;**

Yên pirhejmar:

-an, -ên, -êne; -îne; - îde; -ede

Mînak:

- ***Du lakkêne minî hene, yê gir doxtire, yê biçûk hu debi.***
- ***Va texta kurt e, î dirêj bide min.***
- ***Jina Husên mangan dedoşi, yê min pez dedoşi.***
- ***Mange te pîr şîr dedi, emma î min kem şîr dedi.***
- ***Keçikêne min dexûnin, eha gir le sinfa heştan î.***
- ***Ede ku van geppana depîstin, dekenîn*** (Yên ku ew gotinan dibihîstin dikenîn).
kes (ek), her kes, tukes, her teba (her tişt), ***qet teba, tu teba*** (tu tişt)...

Cînavên enklîtîk/pêvekirî: **-ê.**

Mînak:

- ***Ew zû dirave merik dejmiri, dedê*** (Ew zû diravê mêrik dijmêre û didiyê).
- ***Misto kerî xwe wenda deki, ew pîr lê*** (le+wê/wî) ***degeri.***

BERHEVDANA RENGÎRAN

- komparatîv paşgira **-tir** tê bikaranîn; bo nimûne: ***çe – çetir; mezin- mezintir***
- sûperlatîv: ***en mezin, lap mezin... je safk mezin*** (ji hemûya mezin)

HOKER

- ***çir(g), çiter*** (çawa)
- ***kînge, çiqas/çend***
- ***safk*** (hemû),
- ***kujan*** (kîjan)

Nimûne:

- ***Tu çirg e?*** (Tu çawayî?)
- ***Min weqas (weqes) be te got ku meçe mala cîrên, te ko neda geppê min!*** (Min ewqas bi te re got ku neçe mala cîran, lê te guh ne da gotina min).
- ***wer(g)*** (wisa), ***hawa, hawer*** (bi wî awayî);
- ***Wer meke, hawa bike!*** – (Wisa neke, weha bike!).
- ***nalî, nastirê*** (mîna, weke);

Hokerên demî:

- ***cara, car-cara;*** (carinan, hin caran)
- ***duho*** (roja berî îro), ***huro*** (îro), ***suve*** (roja piştî îro), ***dusuve*** (du roj piştî îro), ***suve*** (danê sibê); ***nîro, êvarê, hişev*** (îşev), ***pêr*** (du roj berî îro), ***petrpêr*** (sê roj berî îro), ***hisal*** (îsal), ***par*** (sala berî îsal), ***pêrar*** (du sal berî niha).
- ***dêy*** (erê, belê), ***na/ne;***
- ***belke***
- ***dê çe!*** – gelek baş!

DAÇEK

pêşdaçekên bingehîn:

- **be, de, je, le.**

paşdaçekên bingehîn:

- **da, ra, ve**

Mînak:

- **Be min ra avni (nanni, xweyni) weyîn!** (Bi min re avê (nanê, xwê) bîne!)
- **Le mal;** lê "de beroş da":
- **Bavve min le mal e;**
- **De (nav) beroş da xarin nemaye.**

Komdaçeka komîtatîv: **peve** (bi wî/wê ve):

- **Ez peve hevale xwe deçime Lêçîn** (Ez bi hevalê xwe ve diçim Laçinê);
- **Tu huro peve ke deşuxulu?** (Tu îro bi kê re kar dikî?)
- **le rev** (li gel, li cem):
- **Were, le rev min rûni** (Were, li cem min rûne).

GIRÊDEK

- **Lê, emma** (ema, feqet, lakin)
- **çunku, bevika** (ji ber ...):
- **Emî nikayin heqqîde xwe bixozin, bevika ku dewlete me tunnu.** (Em nikarin heqên xwe bixwazin, ji ber ku dewleta me tune).
- **loman** – loma, lewma.

HEJMAR

- Hejmarên tekane 1-9 : **yek, dü //düddü, sê//se// sisse, çar, pyenc, şeş, heft, heşt, nehe.**
- Hejmarên ji 10 ta 19: 10- **dehe**; 11- **dew//tew yek**; 12- **tew duddu**; 13-**tew sisse** ; 14- **tew çar**; 15- **tew pyenc**; 16-**tew şeş**; 17-**tew heşt**; 18-**tew heşt**; 19-**tew neh**.
- Hejmarên dehane **bi du şêwazî** tên hejmartin:
 - 1) **de//deh(e), bîst, si//se, çel, penci//pencdeh, şest, hefta, heşt, no//noh.**
 - 2) 10-**de(he)**; 20-**bîst**; 30- **bîst deh**; 40- **du bîst**; 50-**du bîst deh**; 60- se sê bîst; 70- **se bîst deh**; 80- **çar bîst**; 90-**çar bîst deh**.
 - 21-**bîst-i-yek**; 22-**bîst-i duddu**; 23-**bîst-sisse....**
- Hejmarên sedane: **sed, dused, sesed, çarsed, pyencsed....**
123 – **sed-i bîst-i sisse**; 456 – **çar sed-i pyenc-i şeş**.
Hejmarên hezarane: **hezar, duhezar, sehezar....**
- Hejmarên rêzî:
Ji bo çêkirina hejmarên rêzî paşgira "**-an**" tê bikaranîn:
- **roya şeşan; sala pyencan...**

NAVDÊR

Raveka pirhejmariyê : "**-an**", **-ene**, "**-îde**", "**-êde**", **-in**;

Mînak:

- **Le Qûbadliye ti-y-êde kurmanc-an pir in** (Li Qubadliyê gundên kurmancan pir in). Du-se ro-**yan** be şunda (Piştî bi du-sê rojan). Zaro-y-**îde** avva dekevin (Zarok(an) dikevin avê).
- **Manga-y-îde le çiy-an deçeyr-in.** (Manga(yan) li çiyên diçêrin)

- *Elîyî be tore masî-y-an degiri* (Elî bi torê masiyan digirî).
- *Dar-îde le dor re-ne*. (Dar(an) li dor rê ne).
- *Be ro bav – dakke min-îde terin şuxul, ezekî le mektebe dexunim* (Bi roj bav-dêya min diçin kar, ez jî li dibistanê dixwînim).
- *Pir hevale me-y-îde hene* (Pir hevalên me hene).
- *Du lakke min-îde le Moskove dexunin* (Du kurên min li Moskowê dixwînin).
- *Ew çû je dukane je Leyla ra kitab-ene hilgirt* (Ew çû ji dikanê ji Leylê re kitêban kirî).
- *Le tiye me du bîst mal-ne hene, ew her du bîst mal-ne kurmanc in* (Li gundê me çil mal hene, ew her çil mal kurmanc in).
- *Du-se kew-ede li sere tate hebûn* (2-3 kew li serê zinarê hebûn).

Weke di zimanê edebî de, di devoka **Kurdistana Sor** de jî hemû navdêr raveka pirhejmariyê nagirin. Hin navdêr tenê bi yekhejmarê têne bikaranîn:

- a) **navdêrên eşya** (herî (hirî), rûn, pendir, ard, ar (agir), şîr, k'ha (ka), toz, newut (neft), germî (pilaw) .. wd);
- b) **navdêrên abstrakt**, ên ku bi alîkariya suffîksên **-î, -tî** hatine çêkirin (dirêjî, mezinî, bilindî, hevaltî, merîtî (mirovatî),...);
- c) **navdêrên hereketê, yên ji lêkeran çêbûyî** (viyexistin (a ar: vexistina agir), tirsandin, çûyîn, hilgirtin...);
- d) **navdêrên hereketê, yên bi alîkariya lêkerên “kirin” û “bûn”** (paqîşkirin, gewrkirin (sipîkirin), tewlihevkirin, dirêjbûn, sarbûn, girbûn û wd);
- e) **navdêrên** , ku wateya bûyer an kiryanan nîşan didin (ba, serma, hewa, arsim (grîpp), şuxul û wd).

Raveka cinsan:

nêr: **-î, -i, -e, -ê**:

- *bivirek-î min*;
- *zaroyek-î be aqil*;
- *merîyek-î pîr*;
- *tîyan-e wî têşî*; lê: *tîyanek-î min têşî* (diranekî min dêşe);
- *cîran-î me ademek-î çeyî* (cîranê me mirovekî baş e.)
- *Va lakk-ê min gir e* (Ev kurê min ê gir e);

Çemandina navdêrên nêr:

- *ar-êr*; *aş-ê*, *k(h)a-kê*, *ga-gê*, *bira- birê*
- *Eslan- Eslên*; *Laçîn- Lêçîn*; *nêçîrvan- nêçîrvên*, *nan-nên*, *xizan-xizên*; *genim-gênim*

Navdêrên mê (-a, -eki; -eke):

- *avv-a kaniye pîr sar e*;
- *dakk-a min*;
- *xûşk-a min*;
- *mal-a met-a min*;
- *Le tiye me da malek-i filan heye* (Li gundê me malekî ermeniyan/fileyan heye);
- *min sêvek-i sor da wî*;
- *Keçik-eki min le mektebe hu debi* (Keçeke min li dibistanê hîn dibe).

ÇEMANDINA LÊKERAN

Pêşgira berdewamiyê demên niha û roboriya domdar "**de-**" (kêm caran **t-**) ye:

- ezî **de-şuxilim** (ez kar dikim)
- ez **de-şixulîm//de-şixuliyam**
- ezî **ve-de-kim** (vedikim);
- min **ve-de-kir**;
- ezî **te-rim** (ez d(ih)erim, diçim)
- ezî **le-te-xim** (ez lê dixim)
- Xizanî hevdi **te-xin** (Zarok hevdu dixin);

Neyînîkirin:

- ezî **na-şixulim**
- ez **ne-de-şixulim//ne-de-şixuliyam**
- ezî **le-ne-xim**

Pêşgira dema bêt (dema were, future): **-e** ye:

- ez-**e bi-şixulim**
- ez-**e bixum**;

Formên raweya indikatîv:

Dema niha (şixulîn, şandin, bûn)

- | | |
|---|--------------------------------------|
| 1. ezî deşînim, deşixulim, debim | emî deşînin, deşixulin, debin |
| 2. tuyî deşîni(i), deşixulî(i), debî(i) | hûnî deşînin, deşixulin, denin |
| 3. ewî deşîni, deşixuli; debi | ewî, ewîde deşînin, deşixulin, debin |

Dema bêt:

- | | |
|---|--------------------------------|
| 1. eze bişînim, bişixulim, bibim | eme bişînin, bişixulin, bibin |
| 2. tuye bişîni(i), bişixulî(i), bibî(i) | hûne bişînin, bişixulin, bibin |
| 3. ewe bişîni, bişixuli, bibi | ewe bişînin, bişixulin, bibin |

Formên raweya subjunktîv

yên şertanî: **ez bişixuliyama; min î bixwara**

Neyînîkirina raweya fermanî bi **me-** ye.

Mînak:

- **meke, mexwe, vemexwe, meşixul, wemeyîn** (neyîne), **rûmeyîn** (rûnene), **vemeyex, rameyex, lemeyex** (vênexe, ranexe, lênexe)!

PEYVNASÎ

Hin peyv di wê devokê de hene ku pir tîr bikaranîn, lê li deverên din yê kurmancî nayên bikaranîn an kêr tîr bikaranîn:

- **efsirin (ezî tefsirim)**: serma kirin
- **gep kirin**: axaftin, xeberdan
- **safk**: hemû, gişk
- **peve (peve hevdi)**: bi hev re, pev re, bi ... ve (bi hevdu re)
- **xizan**: zarok (ne malbat!)
- **çolik**: toraq, lor

- **bivil:** poz, bêvil
- **beçi::** tilî+pêçî
- **herd:** erd
- **hisal; hiro; hişev:** îsal. îro, îşev
- **tat:** teht, zinar
- **rehet bûn:** westiyan
- **vederketin:** derketin
- **vederxistin:** derxistin
- **bûy:** dewet, zemaven
- **bevika:** (ji ber ..., ji ber sedema..)
- **dêy:** erê, belê

PS: Dinava civaka Kurdistanê Sor de strangotin û govendgirtina bi kurdewarî êdî nemaye.
40 sal berê tenê govenda **Qaz-qaz** dizaniyan...

Tiştê ji folklorê jî ne maye.

Mînakeke biçûk ji folklorê - Ji bo hezkirina zarokan:

De ser te bim careke

Le pin siye dareke (Li bin siyê darekê)

Ez bikujim kareke

Her maleke pareke